

# Nilufer Akbal bi "Herîrî" vegeriya

» RÛPEL 9 Çand û Hûner



# Belav bûna porno-yê ditirsîne

» RÛPEL 10 Jiyan



Versiyona çapkirî ya HAWAR.NET.comê / Çapa Dîjîtal / 20.01.2010  
Hejmara 3

Rojnameya Kurdî a serbixwe

hawarnet.com / hawar.hk-mg.net/PESKETIN

pesketin@hk-mg.net

# Pêşketin

## Deramanê Kurdan konferansekê Neteweyî ye...

• Dewleta Tirk guh nade daxwazên Kurdan û li gor berjewendiyên xwe gavên xwe davêje. Di vê konaxê de jî girîngîya Konferansa Neteweyî Kurdî derdikeve pêş...



### Trajedîya mezin: Haîtî hilweşiya

Li gor hêjmartinên texmîni di encama erdhejê da herî kêm 100 hezar kes mirine, 250 hezar kes birinadar bûne û nêzîkî 3 mîlyon kes bê mal û milk mane. rûpel 6



### Belgefîlmê dengbêj Evdalê Zeynikê hat kişandin

Di diroka dengbêjiya kurdan de Evdalê Zeynikê pirê dengbêjên kurd e. rûpel 8

### Talabanî got 'em dev jê bernadin' » r.3

"Divê Kurd bi zimanê xwe yê zikmakî bîn perwedekirin" » r.2

### Kuşîna dozgerê dijminê kurd PJAK'ê girt ser xwe»r.2

"Du ziman û baholek" di nav 10'an de ye »r.9

### Cîhan dikare bibe qûrbana teqîna stêrkekê?

Dewama nûçeyê di rûpela 8'an de



Divê edî her hêz û aliyê Kurd ji bo yekitiyê bikeve tevgerê

Amed (Pêşketin): Pêwistiya konferansekê neteweyî her roj zêdetir dibe. Li bakûrê Kurdistanê plan û listikên ser pêşaroja gelê Kurd di asteke xeter de ye.

Dewleta tirk bi her avahi ji bo şikandina bizav û îradeya Kurdan hewl dide. Kurdan hê jî wek neteweyê qebûl nakin. Li aliyê din jî pirsgrêka Kerkûkê li ber Kurdan başûr hê jî pirsgrêka serekeye û li benda çareseriyê ye.

Li aliyê din dewleta Tirk amadekariyê gavên "neçar" ji bo çareseriyê pirsgrêka Kurd dike. Piştî dirêj kirina agirbesta PKKê a heta 1ê îlonê amadekariyên gavên nû ên dewleta Tirk de ji bilêztir bû.

### Kurd encax bi yekîtiyê dikarin serkevin

Dewleta Tirk di vê pêşvegerê de di qada navneteweyî de jî bidest xistina qezence siyasi û befirehtir kirina qadên xwe yê tevgerê dixwaze di meseleya Kurd de hin gavên "li gor xwe" bavêje. Wisa xuyaye ku dewleta Tirk wisa difikere ku bi gav avêtinê rê li midaxaleya derve bigre. Lê dewleta Tirk guh nade daxwazên Kurdan û li gor berjewendiyên xwe gavên xwe davêje.

Dewama gotarê di rûpela 5'an de



Ev wêne rastiya Efxenistanê radixe berçavan R7

## Xewneke nîvçe mayî; Komara Kurdistan a Mehabadê

Rengê ala kurdî yê kesk, sor û zer cara yekemîn bi îlana vê komarê re fermî bûn û gihîştin roja me. » r.4

### GOTAR

Çareserî ma bihareke din!...  
SERHAD B.RÊNAS

Kurd divê bi temami ji Tirkiyeyê eqetin...  
Dewama nûçeyê di rûpela 5'an de

### AKTUEL

Serdema zarokên dijital

Derket holê ku zarok çihaneke bê teknoloji xeyal nakin. R8

### TENDURISTÎ

Spor ji bo rê li gellek nexweşiyên digre

Li gor lêkolîna kovara "Circulation"ê de hati weşandinê biahengî spor bê kirin pîrbûna şaneyan dereng dixe. R8

### ZANIST

Dê çihaneke nû peyda bikin

Astronom bi bawerî ku herî dereng di nav 4 salan de çihaneke wek çihana a me wê bê kivşkirin...R8

### Naveroka Din

- » Gotar r.5-6
- » Zanist r.8
- » Aktuel r.10
- » Çand r.8

### Çare dibê ev artêş were belavkirin

ZINARÊ XAMO » r.5

### Ziman şertê heyinê Celadet Bedîrxan û Zimanê Kurdî

QAHIR BATEYÎ » r.4

AMED TÎGRÎS » r.4

### Weşanên HKMG:

HAWAR.NET hawarnet.com  
MUZIKKURD muzikkurd.com  
SINEMAKURD sinemakurd.com  
ZANISTUTEKNOLOJÎ zanistuteknoloji.com  
KURDO kuro.me | JINANE jinane.hk-mg.net  
ABORINAS aborinas.hk-mg.net  
HEMÎD www.hk-mg.net

# "Divê Kurd bi zimanê xwe yê zikmakî bên perwedekirin"

Bi pêşengiya Saziya Parêzeran (BARO)ya Amedê konferansek hat lidarxistin

**AMED (Pêşketin)**

Di konferansê de hat daxwazkirin ku divê pêvajoya bêpevçûnî bê mayîndekirin û bi guhertina destûra bingehîn rê li ber perwerdehiya zimanê kurdî bê vekirin. Konferansa ku ji aliyê Baroya Amedê ve hat amadekirin, bi beşdariya birêvabir û nûnerên baroyên 45 bajarên wek Enqere, Balıkkesir, İzmir, Bursa, Wan, Elîh, Çewlik, Mêrsin û hwd. li Salona Resepsiyonê ya Sumerparkê ya li Amedê hat lidarxistin.

Serokê Baroya Amedê Mehmet Emin Aktar, di axaftina xwe ya vekirina konferansê de bal kişand ku kurdan li dijî politikayên helandinê gelek caran serî hildane û piştî 80 salî hê taze navê pirsgerê ku heta nuha wek 'Ewlehî', 'pirsgera rojhilata bajûr', 'problema paşvemayîne' dihat binavkirin, wekî 'pirsgera kurd' hatiye danîn. Serokê Baroya Amedê Mehmet Emin Aktar, destnîşan kir ku piştî bi navkirina pirsgera kurd ku bûye sedema mirina bi hezaran kesî û rê li ber tehrîbatên civakî, aborî û ekolojîk vekirîye, divê asta wê ji bê diyarkirin û weha got: "Piştî avakirina Komarê,

bi armacan tirkkirina Anatolyayê bi dirûsmeya "yek dewlet, yek al, yek ziman û yek millet" politika hatin meşandin. Kurdan, li dijî van politikayan serhildanên biçek pêkanin. Dewletê jî, ji bo ewisandina van tevgeran, bi navê "çareseriyê" rêbazên bi zorê yên wek girtin, darvekirin, koçberkirin, nefikirin û inkarê pêk anîne." Aktar, herweha bal kişand li ser pêvajoyê û şerê van 25 salên dawî û bilanço ya ku di van 25 salan de derketiye holê û weha got: "Di vê pêvajoyê de 40 hezar kes hatine kuştin, 5



hezar bûyerên qisasnediyar û windayî, 4 hezar 500 gund û mezra hatin şewitandin û valakirin û bi milyonan kes bi destzori hatin koçberkirin, 350 hezar kes hatin binçavkirin, 54 hezar kes hatin girtin û li 24 hezar kesan êşkence hat kirin. Ev tiştên hatine jiyandin, di civakê de bûye sedema travmayeke mezin."

Aktar, di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku ji bo çareseriyê pirsgerê dereng nemine, divê pêvajoya bêpevçûnî bê mayîndekirin û bi guhertina destûra bingehîn, rê li ber perwerdehiya zimanê zikmakî ya bi kurdî bê vekirin û van pêşniyaran kir: -Divê Destûreke Bingehîn ya demokratîk bê çêkirin.

-Divê kurd bi zimanê xwe yê zikmakî bên perwedekirin. -Divê astengên li hemberî zimanê kurdî yên di çapemeniyê de bên rakirin û di zaningehan de enstîtuyên lêkolîna zimanê kurdê bên avakirin. -Divê şert û mercên ji bo tevlibûna siyaseta demokratîk bêne afirandin.

HAWAR.NET.com

# "Ger ku bi rastî çareserî dixwazin divê nûnerên Kurdan muhatap bigrin"

**AMED (Pêşketin)**

Parlamentera berê ya DTP'ê ku hate girtin Aysel Tugluk, ji Kursiya Yê Siyaset Li Wan Hatiye Qedexekirin axivî û got: "Em ê siyaseta bidominin. Em salên bi eş jiyan û me pir tişt wenda kirin. Em hejriyan, birindar bûn, peritîn, hatin kuştin lê êdî em di dema aştiyê de ne. Ji bo aştiyê pir hindik ma. Û dibêjim hewl bidin."

Li gel endamên Komên Aştiyê yên Qendil û Mexmûrê, nûnerên rêxistinên sivil ên civakî, hin parlamenter û şaredarên BDP'î û Dayikên Aştiyê, gelek kes beşdarê konferansê bûn. Axaftina vekirîne ya konferansê ji aliyê Berdevkê Meclisa Aştiyê Cengiz Guleç ve hat kirin. Guleç diyar kir ku astenga herî grîng a li pêşya aştiya mayende ya Tirkiyeyê, pirsgera kurd e û eger derbarê çareseriyê

Agirbesta bêdem û dualî' bê ilankirin Prof. Dr. Cengiz Guleç di axaftina vekirîne ya konferansa Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê de ji bo çareseriyê banga "Agirbesta bêdem" li aliyan kir û xwest dewlet dest ji politikayên 'yekperestiyê berde. Guleç, pêşniyara avakirina Komîsyona Hevrûhatna bi rastiyan a Hihûqê kir û xwest mafên zimanê zikmakî bên nasîn û rîya siyaseta li pêşya endamên PKKê vebe. DİHA



# Qedexeya Kurdî dewam dike; "Welat" bênav ma...



**AMED (Pêşketin)**

Malbata Başer ku navê "Welat" li zarokê xwe yê ku di 21'ê tebaxa 2008'an de li Amedê hate dinê kiribû, berê rastî astengiya Midûriyeta Nifûsê ya Bajêr û piştê jî rastî astengiya 2'emîn Dadgeha İdari ya Amedê hat. Dedagehê, bi hinceta tîpa "W" dijberî "Çanda tirk û kevneşopiya van e"

û dijberî alfabeya tirk e, navê Welat red kir. Malbata Başer jî, biryar wekî "Dirûtiya hikûmetê" nixand. Hevserên bi navê Muhsin û Laima Başer ku li Amedê dijîn, zarokê wan ê ku di 21'ê tebaxa 2008'an de hate dinê, xwestin navê Welat li zarokê xwe bikin. Navê Welat, ji aliyê Midûrê Nifûsê ya Bajêr a

Dedagehê, bi hinceta tîpa "W" dijberî "Çanda tirk û kevneşopiya van e" û dijberî alfabeya tirk e, navê Welat red kir. Malbata Başer jî, biryar wekî "Dirûtiya hikûmetê" nixand..

Amedê bi hinceta di alfabeya tirkî de tîpa "W" nine, hate red kirin. Şaxa İHD'ê ya Amedê jî li ber daxwaza alikariya hiqûqî ya malabata Başer ku serî li Wezareta Karên Hundir da ji bêencam ma. Bêdadi û durûtiya Malbatê jî ber navê Welat li zarokê xwe kirin û nehat qebûl kirin, têkoşina huquqê didin. Malbat, bi vê jî ber navê 'Welat' li zarokê xwe kirin nikarin nasname fermî bigrin. DİHA

# Ji Ber Tirsê Aştiyê Operasyon Dikin

**AMED (Pêşketin)**

Siyasetmedara hatiye qedexekirin Aysel Tugluk ku di Konferansa Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê de axivî, diyar kir ku operasyonên li hemberî siyasetmedarên kurd tén meşandin ji ber tirsê nêzikbûna aştiyê ye û wiha got: "Lê nenêrin ku

siyasetmedarên hatine hilibijartin kelepeçê dikan. Ew ji dibinin ku aştiya tê tirsê wan ji vê yekê ye. Bawer bikin ev hewildana wan a dawiyê ye." Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê li Odela Surmeli ya Enqereyê panela, "Hê dereng nine ji bo aştiyê çareserî di destê me de ye" pêk ani. Di beşa

"Qedexeyên siyasi" de Parlamentera DTP'a hati girtin a qedexeyê kirî Aysel Tugluk axivî. Tugluk bi gotina, "Em de siyaseta bidominin" balkişand ser qedexeya siyasi ya li hemberî wan. Tugluk wiha axivî: "Gelê be berpirsyari daye me û ji ber vê yekê ev qedexeyê de gelek caran bê bînpêkirin. Me jiyana xwe ji bo jiyaneke hevpar a gelan derbas kir.

# Kuştina dozgerê dijminê kurd PJAK'ê girt ser xwe

Rêxistina Hêzên Kurdistanê Rojhelat ya bi PJAK'ê ve girêdayî, bi daxuyaniyekê kuştina dozgerê Xoyê Welî Hecî Qulizade yê ku wek dijminê kurd tén naskirin, girt ser xwe

**HEWLÉR (Pêşketin)**

Di daxuyaniyê de tén ragihandin Dadgehên Rejîma İranê ji aliyê istixbarata İranê ve tén birêvebirin û dozger Qulizade û yên wek wi ji jî bo bizava kurd hatiye wezîfedarkirin. Wezîfeya

Qulizade û yên wek wi ew e ku bi ceza û muameleyên xerab bizava gelê Kurd tén bibin. Di daxuyaniyê de bi berdewami tén ragihandin, ji ber ku dozger Qulizade cezayê idamê li 2 PJAK'iyên bi navê Hesên

Hikmet Demir û Fesih Yasemini biriye, li ser bingeha parastina rewşa û parastina şeref û namûsa gelê Kurd, ew hatiye cezakirin. Banga Hêzên Kurdistanê Rojhelat li rejîma İranê ewe ku ji niha pêve di çarçevaya insani û siyasi de muamele li girtiyên kurd bike.

# Barîna toz û heriyê dîsa destpêkir

Sala par ku ewrên tije toz û herî Kurdistanîyan bêzer kiribû ji nû ve destpêkir

**MÊRDÎN (Pêşketin)**

Roja dîşemê serê sibê ewrê toz û dumanê ji ser Sûriyeyê ve hat û li ser Qosera Mêrdînê û li Rihayê jiyane bi awayek neyînî serobin kir.

Li navenda navçeyê toz dibare û welatî rastî zor û zehetiyên tén. Her wiha hawirdor di bin dumanê de ma û rengê hewayê jî veguherî.

Li aliyê din hate ragihandin ku heta dawiya hefteyê li bakûrê Kurdistanê barîna berf û baranê zêde bibe û pileyên germahiyê jî de dakeve. HAWAR.NET.com

# Şika kesê çawîşê pispor kuştîye Tîmê Xençer e

Hate angaştin ku cerdewanê li Gundê Hamza yê Navçeya Pasûrê di operasyonê de çawîşê pispor kuştîye endamê Tîma Xençer' e. Hate zanin ku koma ji cerdewanên Gundê Hamza pêk tén, cilên HPG'yan li xwe dikan, gefan li gundiyan didin û daristan şewitandine.

# Ji bo Kerkûkê gotin gellek e lê xebat kê m e; Talabanî got 'em dev jê bernadin'

**KERKUK (Pêşketin)**  
Serokê Iraqê Celal Talebani da xuyakirin, ku bajêrê kerkûkê bajêrê kurdistanî ye û ew dev jê bernadin. Serokê Iraqê tekezî li ser xurtbûna hevpeymanîya bi Partiya Demokratî Kurdîstanê jî re kir. Serokê Iraqê doh serdana bajêrê kerkûkê kir û kombûnek berfireh bi kadirên YNK re saz da û tê de bi berfirehî jî, behsa hilbijartinên

parliyamenta Iraqê kir. Li angora evê nûçeya SewtullIraq serokê Iraqê daye xuyakirin, ku qonaxa pêşîya Iraqê qonaxeka sext û dijwar e û pêdivêyî têkoşîna hemû aliyan e, da ku bingehên demokrasîyê bi cih bibin û destûr jî pêk bîhê. Li angora evi jêderî serokê Iraqê tekezî li ser bi cihanina



maddeya 140 û maddeya 142 yê destûra Iraqê kiriye û daye xuyakirin, ku ev herdu madde jî gelê kurdistanê re çarenivîssaz in. Di bareya hevpeymanîya navbera PDK û YNK jî de serokê Iraqê Celal Talebani got: em bê evê hevpeymanîyê nikarin destkevtên destûrî biparêzin.. Herweha, em bê evê hevpeymanîyê nikarin hêviyên xwe jî pêk bînin. Serokê Iraqê Celal Talebani di bareya pîrsa kerkûkê jî de got: kerkûkê bajêrê kurdistanî ye û em ticaran

dev jê bernadin.. divê em li ser bingeha hezkirinê dan û standinê bi hev re bikin, ji ber ku em pêdivêyî siyaseta bîrayane, mirovane û demokratîk in. **Serjimêriya giştî de Kurdistanîbûna Kerkûkê yekalî bike** Biryar e serjimêriya giştî ya Iraqê ku herêma Kurdistanê jî de bigire nav xwe, di meha kewçêrê de bê pêkanin. Serokê dezgeha navendî ya serjimêriyê ya Iraqê Mehdi El'Alan diyar ku herêma Kurdistan, Kerkûkê bi ya xwe dizanin û got: "Lewre serjimêrî de vê meseleyê yekalî bike." AJANSAN

## Pêk anîna referandûmê di xeterê de ye

Referandûma Kerkûkê jî ber zextên dewleta tirk û ji ber qalsiya xebat û diplomasiya Kurdan pêk hat. Niha desthilatdariya Kurdistanana azad bo pêkanîna maddeya 140 û careke din paş ve nexistina wê di nava hewldanên diplomasiyê de ne.

Dewleta Emerîka her çiqas bi rêvebirîya Kurdistanana azad re wek "hevpeyman" dixuye jî wek tê zanin di politikayê de dostaniya bêdawi nîne. Ki heza xwe baştir nişan bide, ki diplomasiyê xurt û bê navber bimeşîne, ki bo pêşerojê çerçoveyê zelal, rûniştî stratejîk derxîne holê ev qezenc dike.

Lê divê Kurd di meseleya Kerkûkê de biisrar bin. Paşvexistina referandûma Kerkûkê tê maneya paşvexistina pêşketina gelê Kurd û ev paşvexistin dibe ku Kerkûkê bi temami ji Kurdistanî bûyîne dût bixe. Divê ev jî bibe politikaya Kurdan. Ger Emerîka û hêzên din bi qerariya Kurdan binin wê neçar bin ku ji encama rewşê razî bin. HAWAR NET.com



## Barzanî: Nexşeya Iraqê piştî hilbijartinan diguhere

RDibe ku hinek nehez dixwazin rewşa Kurdistanê tîk biçê. Lê ez jî hemûyan re dibêjim, ku evaya xewn e û pêk nahê. Nabe ji niha û pê ve xwina kurd bi destê kurd. serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî, civînek bi fermandariya leşkerên Kurdistanê û fermandariya hêzên pêşmergeyên Kurdistanê re çêkir û piştê jî li vir gotarek pêşkêş kir. Barzanî di vî gotara xwe de da xuya kirin ku nehez dixwazin rewşa Kurdistanê tîk biçê, lê ev xewna wan e pêk neyê. " Li ser rewşa Iraqê jî Serokê Kurdistanê got " de piştî hilbijartinên parlamentoya Iraqê, nexşeya siyasi ya Iraqê bê guhertin. Dê Iraqê heta demeka din a dirêj, pêdivêyî rêkvevtinîyê (tewafuqê) be. E Mam Celal jî her kandinê me yê ji bo posta serokatiya Iraqê be."

## Biryara îdamê a Elî Kîmyewî Helebceyîyan kêfxweş kir

### Xizmê dîktatorê Iraqê Sedam Huseyîn bi bernavkê Elî Kîmyewî Elî Hesen El Mecîd, jî ber komkujiya Helebçeyê, bi îdamê hat cezakirin

Dadgeha Bilind a Iraqê, biryara dawî ya derbarê komkujiya Helebçeyê de diyar kir. Dadgehê, Elî Hesen El Mecîdê bi bernavkê Elî Kîmyewî, mîna berpîrsê êrişî kîmyewî ya li Helebçeyê, jî ber li dijî mirovahiyê sûc kiriye bi îdamê ceza kir. Dadgehê, jî wezîrên parastinê yê berê Sultan Haşim jî, jî ber rola wî ya di vî komkujiyê de bi 15 salî, Ferhan Mutle el Ciburî jî bi 10 sal cezayê girtigehê, ceza kir. Rayedarên Şehîd û Mexdûrên Enfalê yê Herêma Federa ya Kurdistanê û gelek mexdûrên komkujiyê ku li salona dadgehê amade bûn, biryara dadgehê ya derbarê Elî Kîmyewî de, bi dilxweşî pêşwazî kirin. Artêşa Iraqê li Helebçeyê di 16 adara sala 1988'an de bi çekên kîmyewî êrişek li dar xist û di encamê de jî 5 hezarî zêdetir kurd mirin, û jî 10 hezarî zêdetir kurd jî birindar bûn. Halebçe, mîna komkujiya herî mezin a sedsala 20'an ku bi çekên kîmyewî pêk hatiye, ket nav rûpelên dirokê.

Elî Kîmyewî, di doza sala 2007'an de jî, jî ber komkujiya Enfalê ya sala 1988'an ku 180 hezar kurd lê hatin kuştin û di doza sala 2008'an de jî, jî ber bi komkujiyan tîkbirina serhildana şiiyan a piştî 1. Şerê Kendavê yê sala 1991'i, bi îdamê hatibû cezakirin. **Biryara îdamkirina Elî Kîmyewî dilê helebceyîyan şad kir** Bi munasebete biryara dawiyê ya dadgeha bilind ya tawanana ya îdamkirina tawanbarê yekemin yê kîmyakirina bajarê Helebçeyê Elî Hesen Mecîd ku jî ber wê tawana mirovatîyê bi Elî Kîmyewî tê naskirin, li Monomenta Şehîdên Kîmyabarankirina Helebçeyê bo cara yekemin di diroka wê monomentê de, ahenga xweşî û şadiyê hate sazîkirin. Li gor biryara dawiyê ya dadgeha bilind ya tawanana ya Iraqê Elî Hesen Mecîd bi îdamê û her yek jî Sultan Haşim û Sabîr Durî bi 15 sal û Ferhan Ciburî jî bi 10 sal cezayê girtinê hatin hikumdayîn. AJANSAN

## 'Tasfiye kirina terorê û qewîkirina yekîtiya tirk'

Wezîrê Karên Hundir ê Tirk Beşîr Atalay ku 'Projeya Yekîtiya Tirk' dimeşîne derbarê xebatên xwe de agahî dan çapemeniyê



**AMED (Pêşketin)**  
Balkêş e ku Atalay di çarçoveya xebatên xwe de tekane icriata kirin a girtina bi sedan nûner û şaredarên gelê kurd ne anîn ziman lê klîşeyên jî serî heta niha dubare dikirin, cardin jî çapemeniyê re vegotin.

Atalay bi taybetî destîşan kir ku xebatên wan tevahî li ser mafên keseyî ne û wiha got: "me TRT 6 vekir, RTUKê jî bo vî rêzîkname amade kir. Her wiha jî bo bi zimanên cuda perwerdehi bê kirin jî YOK dizane. Ji bo em jiyana hemwelatîyan hêsantir bikin noqteyên lêgerînê de bîn kê m kirin

Atalay ligel ku Waliyê Mûşê hefteyek berî niha diyar kir ku ki beşdarî çalakîyên civakî û demokratîk bibin de kuştina wan rewşa bibe.. Atalay ku bi vî gotina xwe di heman demê de bênezaketîya qaymeqam û waliyan a heta niha li hemberî gelê kurd jî itirfa kir, idia kir ku dê wali û qaymeqam zêdetir jî gel hez bikin.! HAWAR NET.com

## Emerîka dê beşeke ji leşkerên xwe li Kurdistanê bicih bike

Serdarê yekê yê arteşa Amerîkayê ya li bakurê Iraqê ragihand ku ew dê piştî meha tebaxê ya îsal piraniya hêzên xwe li Herêma Kurdistanê bicih bikin.

Serkirdeyê yekê yê arteşa Amerîkayê ya li bakurê Iraqê general Anthony Cucolo ragihand ku piraniya hêzên Amerîkayê piştî vekîşîna jî Iraqê dê li Herêma Kurdistanê bi cih bibin ku hejmara wan digihîje jî 21 hezar leşkeran. Li gor rojnâmeya Şerq el Ewsatê Cucolo sedema bicihkirina hêzên leşkerî yê welatê xwe li Herêma Kurdistanê vegehand bo parastina navçeyên nakokbar ên navbera kurd û ereban û herweha bo ayindeya van navçeyan jî qala karên hevaheng ên hêzên pêşmerge û Iraqê kir.



## Rastî eve; Ji %70'ê Tirkan li dijî Kurdan e

Rastiya dijminahiya Tirkan a hemberî Kurdan bi lêkolînekê careke din derket holê. Şirketa Lêkolînan Metropol, derbarê rewşa dawî ya fikrê raya giştî ya Tirkîyê de, lêkolînek pêk anî. Anketa Metropolê nişan dide ku, dijminahiya li hemberî kurdan zêde dibe. Li gori anketê, jî sedî 66'ê beşdaran, keleçekirina siyasatmedar û şaredarên kurd erê dîkin.



HAWAR NET / NÜÇE Ü AGAHI  
TU LI KÛ BÎ, NÜÇE LI WÊ DERÊ YE  
hawarnet.com Kurdî û Kurdistanî

# Ziman şertê heyînê yê pêşîn e

QAHIR BATEYÎ

Rojekê ji Konfîçyûs tî pîrsîn: "Heke ku ji bo rêvebirina welatekî hûn bihatina vexwendin tiştê ewil ku dê we bikira dê çi bûya?" Konfîçyûs wiha bersivê dide: "Bêguman min dê bala xwe bidaya ser ziman, paşê min dê dest bi kar bikira. Lewre heke ku ziman bi qusûr be peyv nêrîna mirov baş venabeje. Nêrîna baş nayê vegotin, tiştên ku divê bîn kirin rast nayên kirin. Dema ku tiştên ku tî xwestin, li gori ku tî xwestin nayên kirin, desthilatî û çand xirab dibe. Heke desthilatî û çand xirab bibe edalet dikeve rîyeke şaş. Dema ku edalet kete rîya şaş, mîletê ku dikeve nava şaşîti û nezaniyê, nizane ka dê çi bike û nizane bê ka ber bi ku ve biçê.

Ji ber vê yekê ye ku tu tiştêk ji ziman girîngtir nîn e." Ramanger Konfîçyûs girîngiya ziman wiha nişan dide. Her wiha di sa gelek ramanger û filozofan der barê zimên de gotinên heja gotine û der barê ziman de ramanên xwe der birine. Weki ku Karl Marks dibêje: "Ziman nêrîna bi xwe ye". W. Won Humkolt dibêje: "Zimanê neteweyekê rihê wê neteweyê ye, rihê wê ji zimanê wê ye." K. Vossler: "Ziman neynika çandê ye" û Wittgenstein dibêje: "Sinorên zimanê mirov, sinorên cihana mirov in". Belê di jiyana civakî de ziman roleke mezin dilize.

Ew ximê bingehîn e neteweyan e. Ji ber vê yekê ziman ne tenê neynika çandê, her wiha weki ku zimanzan Zana Farqînî jî dibêje, „Ew hestiyê piştî neteweyan e.“ Tiştê ku neteweyekê ji neteweyên din cuda dike yê herî bingehîn ziman e, paşê jî çand û huner e. Neteweyek bi ziman, çand û hunera xwe dibe netewe. Heke ku ev yek nebin, neteweyek nikare xwe weki netewe îspat bike. Lewre ew netewe mehkûm dimîne ku di nava neteweyên din de bihele, ango winda bibe.

Li ser axa Mezopotamya û Anatoliyê bi vi awayî gelek ziman û çand winda bûne. Sedemêke windabûna wan çand û zimanan a bingehîn ew e ku ew ziman ne bûne zimanên rojane, yanî li wan zimanan xwedilêderketin çênebûye û ew çand nehatine parastin. Bi vi awayî di nava ziman û çandên neteweyên serdest de winda bûne. Ku mirov bala xwe dide zimanê kurdî, mirov dibîne ku vi zimani gelek dewlemendiya xwe winda kiriye. Çanda xwe winda kiriye. Sedem jî; bi qasî asimilasyon, zilm û zordariya ku li ser e, ew qas jî sedem ew e ku kurdan bi xwe xwediti li ziman û çanda xwe nekiriye. Nexasim di van çend salên dawîn de. Bi derketina Tevergera Azadiyê û bi şerê sih salan re her çiqas gelek imkan û derfet ji bo çand û zimanê kurdî hatibin afirandin jî, lê belê ne kadroyên Tevergera Azadiyê, ne jî bi giştî kurdan ev imkan û derfet bi kar anin. Ji ber vê yekê iro jî talûkeya ku li ber ziman û çanda kurdî hin berdawam e. Halbûkî hem tevgerê û hem jî gel bi xwe dikaribû van derfetên bi kar binin û pêşiyê li ber pişaftin û tehrîbatên li ser ziman û çanda xwe bigirin. Kêda ku em di ber zimanê tirkî de didin ku hin bibin, nîva wê em di ber zimanê kurdî de bidin, em ê hêsaniya zimanê kurdî bibinin. Divê ev yek di serî de ji kadroyan, ji saziyan, ji siyasetmedaran, rewşenbir û hunermendan dest pê bike.

Ku ew pêşengiya vi kari nekin, ev yek di nav gel de jî pêk nayê. Lewre gel her tim dide dî pêşengên xwe. Tabî çawa ku me got divê em di jiyana rojane de zimanê kurdî bi kar binin, divê wisa jî em dakevin kolanan û daxwaza perwerdahiya bi kurdî bikin. Ku em bi sed hezaran, bi milyonan daketin kolanan, me mafê perwerdahiye yê zimanê xwe xwest, hingî ev kampanya watedar dibe. Xwestina perwerdahiya bi zimanê kurdî daxwazêke gerdûnî ye. Tu kes nikare jî vê yekê me sûcdar jî bike. Çawa em daxwazname ji saziyên dewletê yê fermî re dişinin, em wisa dikarin bi sed hezaran biçin ber deriyê Wezaretê Perwerdahiya Neteweyî vê daxwaza xwe ragihinin wan. Weki encam heta ku em di jiyana xwe ya rojane de zimanê xwe bi kar neyînin û bi deh hezaran, bi sed hezaran danekevin kolanan û mafê perwerdahiye nexwazin, naveroka vê kampanyayê ne tiji dibe ne jî ev kampanya bi encam dibe. Ne jî ew kampanya laiyî wî dibe ku di nava çar diwarên hesin de, di nava bêderfetiyan de jî bo me imkanan diafirine û ne jî wan cangoriyên ku di ber vi zimani û welatê şerîna de canê xwe didin. Kilida her tiştî ziman e. Ku deriyê kilida zimên vebû, di pey re gelek kilidên din jî vedibin. Weki ku Celadet Bedîrxan jî dibêje "Ziman şertê heyînê yê pêşîn e."

# Celadet Bedîrxan û Zimanê Kurdî

AMED TÎGRÎS

Li hemû dinyayê insan tevî civakên xwe li gor rêzîkên dialektîk guherînên xwe didominin. Guherîn dixwaze bi xwazahi an jî bi destekari be, ango bi darê zorê be jî her guherin e. Pêk tî û civak her carê xwe jî nû ve dikemilinin. Li welatên azad ev guherin pirani bi veguhêrana dinamikên siyasi-abori re heman demê pêk tî. Ji şoreşa Fransîz û bi vir ve, guherînên herêmi di demeke kin de formeke global werdigirin û bûyerên ku li welatekî dest pê dikin li welatên din jî dibin destpêka tevlihevi an jî şoreşên civakî. Çand, huner û wêje jî, bi vê yekê re jî qalîkên xwe yê teng ên herêmi rizgar dibin û li qada gerdûnî cihê xwe digirin, dibin parçeyek ji çanda dinyayê pê re jî civaka xwe bi xwe re bilind dikin. Her dem, tevliheviyên mezin,

bi xwe re formên nû tinin, modernîte wek şifreya guherîneke bê dawî ye. Tu kes, kom an jî civak nikare xwe ji van guherinan dûr bigire, yan jî xwe jî pelên wan biparêze. Bi taybetî sedsala 20'an, di warê pêşveçûn û tevliheviyên derasayî de bû sedsalek ku bedelî gelek sedsalên diroka mirovahiyê ye. Du şerên cihani, bi hezaran şerên nav welatan, an jî xwe bi xwe yî, hilweşîna bajarên bi çekên atomî-kimyewî, bi dehan jenosid an jî komkuji, avabûna sistemeke sosyalist, pêşveçûnên teknîkî, bişivin û jîholêrabûna feodalîteyê, avabûna civakên pişesazî û wêdeyê wî. Rengguherina kolonyalîzmê, avakirin û danavakirina welatên nû, bi hezaran peyman, hevgerîtin û rêxistin, pêşveçûna çandeke demokratîk, rabûna tixûban, ber bi dawiya sedsalê

terabûna sistema sosyalist û berfirehbûna kapitalîzmê ya global, rûxandina xwezayê, kokbiriya bi hezaran jîndarên ku her yek xelekek ji ekosistema xwezayê bûn. » Û bi milyon bûyer ku, bi nivîsînê dawî li wan nayên. Niha jî, sedsaleke nû û destpêka hezarsaleke nû, ku jê re dibêjin «Milenium». Bi van hemû guherinan re, çanda mirovahiyê jî formên nû wergirt û xwe nû kir. Carina beriya qewimanan bi rîya hunerî rêberiya civakan kir, rê nişan da, carina jî çavdêriyê kir û wêjeya wê afirand. Li civakên pêşketî, dijberiyên li nav çinan lînézîkbûna çand û hunerê jî, jî hev cihê kir. Li aliyekî burjuvazi, tevî çanda xwe ya bilind!

Li aliyê din jî komên din ên civakê û çanda wan a cihêreng. Li civatên bi vi rengî, her komek dikare xwedî formeke çanda cihê be, li aliyê din; jî bo kontrol û birêxistina girseyên gel, jî aliyê burjuvazi ve, belavkirina formên çandê yê populist û dejenere. Divê jî bo welatên pêşketî rewşa şerîyên niştêcih jî di bin xalekê de bê nîrxandin û şirovekirin. Bi van hemû re, çandeke "underground", ango binax jî bingehêke bi serê xwe danî di diroka çandî ya gerdûnî de. Rojava dema xwe ya kaotîk, bi şer û pevçûn be jî bi ronensansê xemiland, bi alikariya şoreşa burjuvazi jî,

çandeke nû ya demokratîk li nav civakên xwe belav kir û rêyeke nû li ber mirovahiyê vekir. Lê berî ku burjuvazi bigihêje vê çanda demokratîk, bi kirinên, xwe, bi pest û pêkutiyên li ser çina karkeran, bû sedema pêşketina çandeke dijberî xwe. Çanda çinê bindest li hemû dinyayê di destpêkê de ramanên utopîk, bi demê re jî îdeolojîyêk xurt afirand. Derî li şoreşêke mezin vekir. Piştî şerê yekemîn e cihanê li Rûsyayê û çend komarên pê ve girêdayî, piştî şerê duyemîn jî li gelek welatên din bû rejîmeke nû ya çina karkeran. Demeke nû, çandeke nû derxiste holê. Li dinyayeke ku ji du qutban pêk dihat, rîsta çandê ya li ser civakê jî jî

hev cuda bû. Mirovahi bi humanîzmê hesiya, li aliyê din jî dijberiyên li nav herdu sisteman, gelek welat û civakên biçûk jî jî hev xistin û ew pelçiqandin. Wek avabûna sistema sosyalist, terabûna wê jî guherînên mezin çekirin li nav hemû welatên dinyayê. Weke hemû civakan, civaka Kurd jî bandoreke mezin ji van guherinan wergirt. Di sedsala bîstam de, pêşketina mîmarîyê, avabûna bajarên mezin, ango metropolan jî rengê guhêrana civakê tespit kirin.

Neyê jîbirkirin ku pêşketina çanda mirovahiyê bi bajarvaniyê ve girêdayî ye. Niha êdî dora nîrxandina civaka me û çanda me ya qedim e. Heta ku jî destê min tî, ez ê bi zimanekî vekirî fikrên xwe yî li ser vi awayî bilêv bikim. Bê guman, mijar gelek fireh e û dibe ku ez nikaribim di nav sinorên çend gotaran de li ser hemû xalên mijarê bi kûrahi rawestim, di sa jî, dikarin hêvî bikim ku wê bala xwendevanan bikişê ser vê problema girîng û derî li nîqaşêke kûr veke, da ku pisporên vi kari jî tevî nîqaşê bibin û fikrên xwe yê hêja bêjin!

# HÊZAXÊZ



# Xewneke nîvçe mayî; Komara Kurdistan a Mehabadê

Di nava sedsala 20 an de, piştî hukumeta Başûrê Kurdistanê ku Şex Mehmed Berzencî li Silêmaniye ilan kir, Komara Kurdistan a Mahabadê, di warê dewletbûyîna de, jî bo Kurdan bû tecrûbeyek duyem. Lê belê, hin welat jî bo berjewendiyên xwe, Komara Muhabadê, feda kirin. Di 22'ê Çileya sala 1946'an de, berî 53 salan weke iro, bi alikariya Yekitiya Sovyetê, li Meydana Çarçira ya Mahabad, Komara Mahabadê jî aliyê Qazi Muhammed ve hate îlan kirin. 13 wezîrên ku di komara Mahabadê de cih girtin, piştî demekê Desturabingehîn a komarê zelal kirin. Komara Mahabadê, her çiqas heta demek kin berdewam kir-jî di wê demê de, bû navenda siyaset û ronahiyê. Komara ku li Mahabadê hate saz kirin, ala netewî ya Kurdistanê hilda û Gel-jî, artêşa welêt saz kir. Hukumeta Komarê, herwiha rêxistinên abori, civakî, edebî, hunerî û rêxistinên leşkerî-jî saz kir. Rojname û kovar derketin. Sistema birêvebir ya Komarê-jî hate saz kirin. Hewl hate dayin ku sistema perwerde û ziman were pêşxistin. Zimanê Kurdî bi fermî hate qebulkirin. Şanoya Kurd hate saz kirin. Ji bo jin di aliyê siyasi û civakî de pêşbikêvin, di 14'ê Adarê de, Yekitiya Jinên Kurdistan hate saz kirin. Herwiha hewl hate dayin ku tîkiliyên diplomasi-jî werin xurt kirin. Bi kurtahî, herçend temenê Komara Mahabad kin be-jî, Mahabad di vê demê de bû navenda siyaset û rewşenbiriye.

Piştî îlan kirina Komarê, Yekitiya Sovyetê desteka ku dida Qazi Muhammed, paşve kişand û di 16'ê Mijdara sala 1946'an de, hêzên Artêşa Îranê Paytexta Azerbeycanê bi destxistin û ber bi Mahabadê ve meşyan. Hêzên Rejîma Îranê, bi desteka Britanya, di 17'ê Kanuna sal 1946'an de, Komara Kurdistanê ya li Mahabadê hilweşand. Li Mahabadê di merasîma saz kirina Komara Kurdistanê de, Qazi Muhammed wiha sond xwaribû; Bi mezinahiya Xwedê, Rumetiya Kurana Kerîm, li ser Welat û ala min, ez sond diwixim, heta dilopa dawî ya xwîna min û nefesa min a dawî, bi can û Malê xwe, di rêya azadiyê de, jî bo alên me li azamanan pêl bidin, ezê tîbikoşim. Qazi Muhammed, Wezîrê Parastîne Seyfî Qazî û birayê wî Sadrî Qazî, li Meydana Çarçira ya ku Komara Mahabadê hatibû îlan kirin, di 31'ê Adara sala 1947'an de, hatin dardekirin. Rengê ala kurdî yê kesk, sor û zer cara yekemîn bi îlana vê komarê re fermî bûn û gihiştin roja me. Ji girseya gel a wê rojê li Meydana Çarçirayê kombû Qazi Mihemed bi van gotinan saz bûna komarê îlan kir: "Vê kêliyê Komara Kurt a Xweser hate saz kirin." Zimanê komara hate saz kirin kurdî bû. Sirûda netewî ya komarê jî helbesta Dildar a bi navê "Ey Reqîb" di sala 1938'an de li girtigehê nivîsandibû hatibû pejirandin.

Ev merş di roja me de jî jî aliyê piraniya kurdan ve tî pejirandin. Paytexta komarê Mahabad a ku lê hatibû îlan kirin bû. Qazi Mihemed bû serok komar, Hecî Baba şeyh jî bû serokwezîrê komarê. Desteya Wezîran a komarê ku bajarên Mahabad, Sine, Uşnu, Miyandoab jî di nav de cih digirtin jî 13 wezîran pêk dihat. 21'ê Adar a 1946'an cara yekemîn kurdan bi rengekî serbixwe pîroz kir. Qazi Mihemed di axaftina Newrozê de jî bo alikariya dayî jî rêveberiya Sovyete re spasiyê xwe pêşkêş dikir. Lê belê di dimeke kin de hevkarîya Sovyetê û rejîma Îranê encamên trajîk bixwera anin. Sovyetê piştî lihev kirinê di 9'ê Gulanê de leşkerên xwe jî Îranê kişandin. Piştî vê yekê di 17'ê Qanûna heman salê de şahê Îranê artêşa xwe şand ser herêma Kurdistanê û dawî li hebûna Komara Mahabadê anî. Serxwebûna komarê tenê 330 rojî domand. Serok komar Qazi Mihemed, Serowezîr Hecî Baba şeyh, Wezîrê Parastîne Mihemed Husayin Han Seyfî Kadi, Birayê Qazî Mihemed Sadrî Qazî û pîsmamê wî Sadrî Qazî li Meydana Çarçira bi dizi hatin dardekirin. Di dema darizandinê de Qazî Mihemed berxwedaneke bêhempa nişan dabû û bi van gotinên jî rayedarên Îranê re helwesta xwe nişan dabû: "Destê we wê tu caran negihîje ala Kurdistanê. Rojek wê were ew al wê li cihê wê mahkemeya ez lê tîm darizandinê bê daliqandin û li ser vê avahiyê pêl bide."

# Çareserî ma bihareke din!...

Ger ji bo çareseriya pirsgrêka Kurd de gavên cidî nevéje wê Kurdan êdî careke din bawerî bi dewleta Tirk neynin û bi temami ji Tirkîyeyê veqetin...

## Serhad B.RÊNAS

Serokomarê Tirk Abdullah Gul digot ku isal wê pirsgrêka kurd bê çareserkin û "Dê tiştên pir baş" çêbin. Mixabin di nava kurdan de ji gelek alî bi van gotinan hatin xapandin û di wê baweriyê de bûn wê pirsgrêka kurd li Tirkîyeyê bê çareserkin. Piştê AKP "nexşerê" ya xwe ya çareseriyê diyar kir. Di plana AKP tu daxwazên serke yê Kurdan tune bû. Wek perwerdeya bi zimanê Kurdî, berfrehtir kirina mafên rêvebiriyên herêmi û hwd... Li gel wê yekê ji DTP ji tevde hemû aliyên Kurd piştigiriya "rêlivekirina" AKP kirin. Heta wê demê Ahmet Turk got; "Em hevî dikin ku AKP ji dil be û wêrek b da ku çareserî nemîne bihareke din".

Lê stukaparêzên di nav ordiya Tirk û çeteyên nav dewletê çavê AKP tirsandin. Li aliyekî dilê AKP ji tune b:Û Kurdan wek netwe qebûl bike. AKP tenê xwest mafên kesayeti bide. Derket holê ku AKP ji ji bihez bûna Kurdan,, birexistin bûyina Kurda û NETEW bûna Kurdan nedixwest. Ji aliyê hikumeta AKP ve gavên berbiçav nehate avêtin. Êrişên ser Kurdan di rojên dawî de ji nû ve zêde bû. Û li ser hev bûyerên dawîn qewimîn û çareserî ma bihareke din.... Dewleta Tirk naxwaze Kurd pêşkevin Her çiqas dewleta Tirk di çareser kirina pirsgrêka kurd de hin agav davêje be ji dewleta Tirk naxwaze kurd pêşkevin û li gor Tirkan divê Kurd neyine tune kirin ji divê bêne kontrol kirin.

Ji ber wê yekê divê hemû rexistinên kurdan di wê mijarê de hişyar bin. Dêdikeve holê ku AKP li şûna êrişî Kurdan bike bi entegre kirin û bi dirêj kirina pêvajoyê dixwaze pirsgrêka Kurd ji holê rake. **Astenga herî mezin ordiya Tirk e** Ji avabûna heta îro dewleta Tirk di eslê xwe de dewleteke militariste ku hemû bingehên wan ser derew, tirs û tehdîtan hatiye avakirin. Ji ber wê bingeha pûç girseya kemalist û xwedi berjewendi û derdorên birêvebirîya veşartî ditirsîn ku bi guherandina perçeyêke biçûk ya

derewên ku bingeha komara Tirk e wê bibe sedema têkçûna hemû derewan û hilweşîna wê komarê. Arteşa faşist-kemalist a Tirkan bo parastina wê pergale gelek caran bi derbeyên vekirî an ji veşartî midaxaleyi demokrasiyê kirin. Minaka herî mezin û herî dawî ji darbeya 12 ilona 1980 e ku piştî 12 ilonê bakûrê Kurdistanê him ji di tevahiya Tirkîyeyê civakeke bêhîz hate afirandin. Ji yana gel bi bernamêyên televizyonê tewş tîn dizin û mêjiya gel hatiye wala kirin. Êdî di serî de ciwan li Tirkîye mirov napirsîn, nafikirin û rastîyan nabinin. Dewleta Tirk bi wan êrişên dawî dixwaze ku xwebaweriya kurdan ku

bi serketina hilbijartinê zêde bû bişkinê û rê li berbifêh bûna serketin û pêşveçûna Kurdan bigre. Li bakûrê Kurdistanê operasyonên leşkerî berfireh dibe û li aliyekî din ji rayedarên dewleta Tirk dest bi tehdîtan kirin. Dewleta Tirk ku di çareser kirina pirsgrêka Kurd de bi avayekî durrû tevdigere û piştî gavên baş her tim gavên êrişkirinê ser kurdan davêje. Rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd diyar dikin ku eger Erdogan bi temami paşve gav bavêje û ji bo çareseriya pirsgrêka Kurd de gavên cidî nevéje wê Kurdan êdî careke din bawerî bi dewleta Tirk neynin û bi temami ji Tirkîyeyê veqetin.

serhadbrenas@yahoo.com

## Çare dibê ev artêş were belavkirin

### ZINARÊ XAMO

Li gor rojnâmeya Tarafê îro dinivise, di sala 2003-an da piştî ku AKP hatiye ser hukim di bin serokatiya Serokê Ordiya 1-ê Orgeneral Çetin Dogan da haziriya darbeyêke hatiye kirin. Navê darbeyê kirine "Zomp/Balyoz" û li gor darbeyên din, ev darbeya herî bi hazirî û herî mezin e. Ji ta heta derziyê li hertiştî fikirine û amadeyiya hertiştî kirine. Di sala 2003-an da generalên arteşa tirk di bin serokatiya Çetin Dogan da civiyane û biryara darbeyeke leşkerî dane. Û Darbeya 12-ê îlonê ji ji xwe ra weke numûne girtine. Du merheleyên plana darbeyê tesbit kirine. Di merheleya pêşî da ewê tevlihevi, teşele û bûyerên mezin werin derxistin û kuştin çêbibin, ji bo ku şertên idareya urfî amade bikin. Lê ji bo wê ji biryarên qetliamên pir mezin girtine. Biryar dane di serî da rojêke iniyê li Mizgefta Fatihê ewê bombeyeke pir bi tesir biteqîn û gelek kesan bikujin. Ji bo vi kerî ji hemû hazirî kirine, kroke çêkirine, kesên bombeyê bicî bikin tespit kirine. Piştî wê, li Mizgefta Beyazitê ji ewê bombeyeke din biteqîn, li wir ji ewê bi sedan kes bikuştana û birindar bikirana. Dûra ji ewê bi hin behaneyan bi hezên Yûnan yê hewayî ra têtetana şer û hewil bidina ku balafirên Yûnan balafireke tirk bixine. Lê heger yûnanan nexista, wan ê bixwe balafireke xwe bixistana û bi vi hawî ji rewşêke pir kritik peyda bikirana. Yanî ji bo ku urfî idareya leşkerî ilan bikin di mizgeftan da ewê bombe biteqandana û balafirên xwe bixistana û têxin hustuyê Yûnanistanê. Ji bo ku milet binin xeleanê. Piştî ilankirina urfî idareya leşkerî ewê darbeyê bikirana û dest dayniyana ser hukim û dest bi teror, kuştina kesên muxalif lê bi taybetî ji kuştina kurd û hin hêz û gurûbên îslamî bikirana. Plan û programa darbeyê bi teferuat çêkirine. Wisa ku, piştî darbeyê listeya endamên kabineyi ji hazir kirine. Listeya kesên ewê werin girtin, kesên ji ortê werin rakirin yek bi yek nivisîne û hazir kirine. Heta bigihîje kijan reisên belediyan ewê ji kar werin girtin û kê têkve dewsa wan, ew ji yek bi yek tespit kirine. Di 5000 hezar rûpelî da hemû kar û barên ku ewê piştî darbeyê bikin yek bi yek rêzkirine. Û ev hazirî ji bi belge, îmze û bi kasêtan hemû di destê dozgeran da ne. Yanî tu tiştêki veşartî tune. Lê di sa ji nikanin amadekar û berpirsiyarên van sûcan bigrin û teslimî edaletê bikin. Bistek berê serokê darbeya "Zomp" generalê teqawit Çetin Dogan, di Star TV-da bi Ugur Dundar ra dipeyivî. Min bistekê lê guhdarî kir, min bala xwe dayê mîrik qet ne xema wî ye, henekê xwe bi van belge û delîlan dikir. Û hin tişt ji diparast. Ji mehê carê darbeyê bi delil û êspat ifşa dibe, navê mesûlan eşkere dibe. Lê netice tune. Ne yek e, ne duduye, hemû general, hemû zabîten rutbebilind bi hawakî di sûc geriyane û fêrî iktidarê bûne. Leşker ji sivilan ra dibêjin ya hûnê ji emrê me dernekevin û hertiştî li gor daxwaz me bikin ya ji emê bi darê zorê tim dest deynin ser hukim û we ji meclisê biqewirînin. Kî bûye serokerkan û general qet ferq nake, miheqeq xwe tevi siyasê û idareya welêt kirine û xwestine dewlet û hukûmetê idare bikin. Tu dibêji qey karê wan ne leşkerî, siyasê e. Hukûmeta ku ev emir qebûl nekiriye bi zor xistine û îro ji dixwazin bixînin. Ji Ozal bikeve ev cara pêşî ye ku hukûmeta AKP-ê li hember artêşê serî natewîne û bi emrê wan nake. Loma ji ji sala 2003-an û virda ye, yanî ji roja ku AKP hatiye ser hukim û virda çend caran xwestine li hember hukûmeta AKP-ê darbeyêke bikin. Lê biserneketine. Di virda li gel şertên der û hundur, rola Erdogan ji girîng e. Erdogan weke Demirel û Erbakan nareve. Erê newêre tam berê xwe bide wan û hemû generalên sûcdar bide girtin, lê ji ber wan ji danaxwe, teslim ji nabe. Ev gelkî girîng e. Erdogan dixwaze hêdi, hêdi bi reforman artêşê bine rê. Lê ev îş bi pişopişo û "nermkirinê" nabe, dibê ev artêş ji kok da were tasfiye kirin û artêşêke nuh were çêkirin. Ev ji bi çareserkirina mesela kurd va girêdayîye. Heta ku mafê mîletê kurd yê netewî neyê dayin û şer raneweste di nava artêşê da reformeke radikal ne mimkûn e. Ev artêş ji zabîte herî biçûk bigre, heya bi generalê herî mezin hemû bi kultura darbeyê perwerde bûne û pir hindik giş ji di sûc geriyane. Ji bo ku Tirkîye ji tehdita darbeyên leşkerî xelas bibe dibê ev artêşa darbeyê û çete ji bin da were guhertin.

# Deramanê Kurdan konferanseke netewî ye

## PÊŞKETIN

Pêwistiya konferanseke neteweyî her roj zêdetir dibe. Li bakûrê Kurdistanê plan û listikên ser pêşaroja gelê Kurd di asteke xeter de ye. Dewleta tirk bi her avahî ji bo şikandina bizav û îradeya Kurdan hewl dide. Kurdan hê ji wek neteweyê qebûl nakin. Li aliyekî din ji pirsgrêka Kerkûkê li ber Kurden başûr hê ji pirsgrêka serekeye û li benda çareseriyê ye. Li aliyê din dewleta Tirk amadekariyê gavên "neçar" ji bo çareseriya pirsgrêka Kurd dike. Piştî dirêj kirina agirbesta PKKê a heta 1ê îlonê amadekariyên gavên nû ên dewleta Tirk de ji bilêztir bû.

## Kurd encax bi yekîtiyê dikarin serkevin

Dewleta Tirk di wê pêvajoyê de di qada navneteweyî de ji bidest xistina qezenca siyasî û befrehtir kirina qadên xwe yê tevgerê dixwaze di meseleya Kurd de hin gavên "li gor xwe" bavêje. Wisa xuyaye ku dewleta Tirk wisa difikere ku bi gav avêtinê rê li midaxaleya derve bigre. Lê dewleta Tirk guh nade daxwazên Kurdan û li gor berjewendiyên xwe gavên xwe davêje. Di wê konaxê de ji girîngiya Konferansa Neteweyî Kurdî derdikeve pêş. Wek tê zanin Konferansa Neteweyî ku ji ber zextên dewleta Tirk hate paşve xistin û di hate idda kirin de piştî hilbijartinên li Kurdistan Federal bê pêk anin. Kurd encax di wê pêvajoyê dikarin bi Konferanseke Neteweyî zextên dewletên dagirker bidin sekinandin û qadake stratejîka pêşketinê bidest bixin. Her wiha Kurd dikarin bi konferanseke wisa riya çareseriyê ji bo pirsgrêkên wek perwerdeya Kurdî, mesela Kerkûkê, avakirina mecliseke neteweyî, meseleya Elfebeyê, têkiliyên navbara perçeyên Kurdistanê.

Referandûma Kerkûkê ji ber zextên dewleta tirk û ji ber qliya xebat û diplomasiya Kurdan pêk hat. Niha desthilatdariya Kurdistanê azad bo pêkanîna mdeye 140 û careke din paş ve nexistina wê di nava hewldanên diplomasiyê de ne.

## Divê her hêz û aliyê Kurd bikeve tevgerê

Ji bo pêk anina Konferanseke Neteweyî divê her alî rola ku dikeve ser wê bileyze. Ji xeynî PKK, PDK û YNK divê hêz û parti û rexistin û dezgeh û heta weşanên medyaya Kurdî pêk anina Konferansa Neteweyî weki erkeke neteweyî bizane çî bi çalakiyan, çî bi hevdişinên navxwe, çî bi nûçe û gotaran divê her alî tiştêki li gor delfetên xwe ji bo pêkanîna konferansê bike. Çareseriya pirsgrêka Kurd di raya giştî de û rojevê de xala yekemîn e. Dewleta Tirk ku di çareser kirina pirsgrêka Kurd de bi avayekî durrû tevdigere û piştî gavên baş her tim gavên êrişkirinê ser kurdan davêje. Divê ev pêvajoya diroki baş were bikaranîn. Ger wisa nebe dê ji wê rewşê tenê PKK, PDK û YNK berpirsiyar nebin..

## Dewleta Tirk ji bo şikandina "xwe baweriya Kurdan" êriş dike

Dewleta tirk di mehên dawî de bi her avayî êrişî ser Kurdan dike. DTP hate girtin. Kurd tene linc kirin, ser bikaranîna zimanê Kurdî cezayên giran tîn dayin, siyasetmedarên

Kurd tene girtin û weki girtiyên Guantanamo hê hate kelemce kirin. Zext û êrişên ser Kurdan û dezgehên Kurdan her roj zêdetir dibe. Operasyonên leşkerî ji nû zêde bûn. Listikên berê ji nû tê pêşxistin. Qedexyên hemberî zimanê kurdî zêde dibe.

Piştî ku dewleta Tirk di hilbijartinan de bi destê AKP nekarî Kurdan bêhêz bike ji nû dest bi dîk û dolabên xwe yê berê kir.

Dewleta Tirk bi wan êrişên dawî dixwaze ku xwebaweriya kurdan ku bi serketina hilbijartinê zêde bû bişkinê û rê li berbifêh bûna serketin û pêşveçûna Kurdan bigre. Maskeya Dewleta Tirk a "demokrasiyê" bi tîkçûna AKP di hilbijartinana de li bakûrê Kurdistanê ket xwarê Zext û êrişên hemberî Kurdan zêde bû. Rayedarên dewleta Tirk ji nû ve dest bi tehdîtan kirin.

## Dewleta Tirk naxwaze Kurd xwebawer bin

Her çiqas dewleta Tirk di çareser kirina pirsgrêka kurd de hin agav davêje be ji dewleta Tirk naxwaze kurd pêşkevin û li gor Tirkan divê Kurd neyine tune kirin ji divê bêne kontrol kirin. Ji ber wê yekê divê hemû rexistinên kurdan di wê mijarê de hişyar bin. Dêdikeve holê ku AKP li şûna êrişî Kurdan bike bi entegre kirin û bi dirêj kirina pêvajoyê dixwaze pirsgrêka Kurd ji holê rake.



# Navneteweyî

## Trajedîya mezin: Haîtî hilweşiya

Li Haîtîyê bi pileya 7.0 erdhêjek pêk hat

AMED (Pêşketin)

Haîtî ku yek ji welatê giravê a li deryaya Karayîpê de ye û nêzi Kuba û Emerîkayê ye bi erdhêjê mezin serûbin bû. Hate diyar kirin ku hemû avahiyên fermî ên di paytexta Haîtî de hilweşiyane. Tê diyar kirin ku li Haîtîyê ji 200 salan vir ve cara pêşî erdhêjê wisa mezin pêk hatiye. Haîtî yek ji welatê herî feqîr a cihanê ye. Li gor hêjmartinên texmîni di encama erdhêjê da herî kêm 100 hezar kes mirine, 250 hezar kes birinadar bûne û nêzîkî 3 milyon kes bê mal û milk mane. Lê xezeba mezin hê di pêş da ye: Kesên ku ji bin kavilan hatine derxistin, bi quloriyên nexweşiyên, birçibûnê, tibûnê, û bi nexweşiyên şewbê ra rû bi rû biminin, û dibe ku ji destê suçdarên ku ji girtigehan reviyane, bèn kuştin ji.

Di 12 Kanûna Paşin li berbangê seet 4 û 53 deqeyan de, ewrên toz û dûmanê rûyê paytexta Haîtîyê Port-o-Prênsê girtin. Di nav çend saniyên de nivê bajêr tune bû. Kesên ku karibûn derkevin derve, ne dizanin kuda birevin. Xetên telefonê û elektrîkê hatibûn birin. Di bin kavilan da nalenala birindaran bû. Gelek kesên, ku ji bin kavilan dihatin derxistin, ji ber tunebûna alikariya bijîşkî di ci da dimiriyan. Rêyên nexweşxaneyan ji hatibûn birin.

Welatiyên Haîtîyê du roj bi trajedîya va bi serê xwe man. Û tenê di 14 mehê da ji derva alikariya insani û yê hewariyê hatin Haîtîyê. Rizgarkerên Rûsî yê ji Wezaretê Rewşên Awarte di cih da 4 balafira taybetî amade kirin û piştî 20 saet firinê xwe gihandin Haîtîyê. Nûnera fermî ya Wezaretê Rewşên Awarte ya Rûsyayê Yélêna Çernaovayê dibêje peywîra rizgarkerên Rûsî çar in:



- Ya pêşin lêgerina mirovan li bin kavilan û derxistina wan e. Jibo vê yekê di destê rizgarkerên me da segên perwerdekirî, dam û dezgeh û alavên hidravlik hene. Ya duyemîn, alikariya bijîşkî û psikolojî. Ji bo vê yekê Wezaretê Rewşên Awarte nexweşxaneyêke aêromobil birîye wira. Ew dikare wekî otonom kar bike di heman demê da 50 nexweşî qebûl bike û operasyonên neştergerî pêk bîne. Ya sêyemîn

bikaranina balafirên Rûsyayê li Haîtî ye. Balafirên IL-76 bi daxwaza rêxistinê civakî dikare ji welatên dereke alikariya insani bine herême. Peywîra çaremîn ji, li gel NY nirxandina ziyana erdhêjê. - Vê gavê li Haîtîyê grûpên hewarhatinê yê Amêrikayê, Îsrayîlê, Fransayê, Îspanyayê, Çînê, Brazîlê û welatên din kar dikin. HAWAR.NET.com

## Emerîka eskerên xwe li Haîtîyê bi cîh dike



Hate zanin ku eskerên Emerîkî hejmara serbazên xwe li Haîtî zêde dike. Helikopterên Amerîkî gehîştine avahiya koşka serokatîya wêran bûyî li Port-au-Prince ya paytext. Her weha hejmarake serbazên Amerîkî nexweşxana sereki ya paytextê diparêzin. Chavez Amerîka tawanbar kir ku Haîtîyê dagir dike. Hugo Chavez duh tevî ku ragihand ew alikariyên zêde ji bo xelkê Haîtîyê dişinin, Amerîka tawanbar kir ku vê derfetê ji bo dagir kirina Haîtîyê bikar tîne. Artêşa Amerîkayê benderên Haîtîyê û balafirgeha serekeye Porto Perence paytexta vî welatî xistine bin kontrola xwe.

Chavez her wiha got: wiha xûya dike ku Amerîkî vê derfetê ji bo dagir kirina Haîtîyê a bi eskeran bikar tinin. Eva li halekê de ye ku Daniel Ortega serok komarê Nikaraguayê ji roja şemiyê şandina bi hezaran eskerên Amerîkî bo Haîtîyê rexne kir. Ortega her wiha got: bi rasti tiştê ku li Haîtîyê diqewime fikaran çêdike, çimku Amerîkî vê derfetê ji bo bi cih kirina eskerên xwe li Haîtîyê bikar tinin. Sekreterê giştîye NY ji ji konseya ewlehiya vê saziyê xwest ku 1500 efsêrên polis û 2 hezar ji parêzvanên aştiyê bişîne Haîtîyê.

## Rojgiran a pêşî ya salê



Dirêtirîn rojgîran çê bû

Ev rojgirana han 07 xulekan (deqîqeyan) berdewam bû. Ev rojgirana han, serê sibehê di demjimêr 08:28 de dest pê bû. Li gora pêzanînen xelkên welatên Ereban, Asiya û Afrika, ev rojgirana han ditin. Serokê feleknasên Kurdistanê Eji Çeto Hesen, da xuyakirin, ku rojgirana evê carê xelekane bû û ne tamam bû. Weha ji got, ku di destpêkê de li kenarên rojhilata Afrika diyar bû. Eji Çeto Hesen got: Heyv nikare bi temami rojê veşêre û weha, rojgirana xelekane dirist dibe.. ew ji ji ber ku hingê heyv - a ku dikeve navbera rojê û zemîne de - di gerra xwe ya herî dûr de ye.. HAWAR.NET.com

## Li Tirkiyeyê 627 kes ji ber şewba berzan mirin

Li Ewrûpa û gelek welatên din, hejmara kesên ji ber şewba barazê dimirin, kêm dibe



Lê belê li Tirkiyê ji, hejmara miriyan zêde dibe. Wezereta Tenduristîya Tirk der barê nexweşîya şewba berazan de daxuyaniyek weşand. Wezeretê idia kiriye ku hejmara kesên ji ber vê nexweşiyê dimirin kêm dibe. Li gori wezeretê, hejmara kesên heta niha ji ber şewba barazê mirine, gihiştîye 627 kesan. Wezeretê anî ziman ku 67 kes ji ber vê nexweşiyê li nexweşxaneyan tedawî dibin û ji wan, rewşa 22 kesan ji giran e.

**HAWAR** NET.com

kurdistan zanyarî zaxo amed duhok mêrdin batman hewlêr sine agirî xaneqîn cizîr erxeni afrin wan colêmerg mehebad riha erdîş bedlis sêrt şîmex idir qamişlo kerkûk

aktuel çand rojev zanist ziman huner medya şîrove

zanîn xwe nasîn e...

**HAWAR NET**  
hawarnet.com

# Li Efxenîstanê rewş ber bi baş bûyîne ve NAÇE

Mîlîtanên Talîbanê bi hêzeke mezin bi ser avahiyên fermî yên li navenda paytexta Afganistanê Qabilê de girtin. Li gorî agahiyên hatin bidestxistin serdagirtin berfireh bû û demeke dirêj dom kir. Di vê serdagirtinê de li gelek deverên Qabilê teqînên pir mezin pêk hatin.

KABİL (Pêşketin)

Hêzên Talîbanê li navenda Qabilê bi ser gelek cihên stratejîk de girtin. Serdagirtin destê serê sibê piştî militanek li ber avahiya Serokdewletê Afganistanê Hamîd Qarzaî teqîna xwekujî pêk ani, dest pê kir. Militanên di serdagirtinê de Qesra Serokatîyê, Wezaretên Dadê û Parastîne, Bankaya Navendî û otela Serena ku biyani lê dimînin, kirin hedef.

Şahîdên zindî yên bûyerê aşkera dikin ku li gelek deverên paytextê dûman bilind dibe, lêkdanên mezin û berfireh didomin. Rayedarên Afganistanê diyar dikin ku serdagirtin bi 10 mîlîtanên xwekujî pêk hatiye. Rayedar vedibêjin ku mîlîtanên Talîbanê ketin nav navendên bazirgani û bankayan. Li ser vê di nav mîlîtan û hêzên

dewletê yên polis û leşkeran de şer dest pê kir. Berdevkê Talîbanê li ser bûyerê daxuyani da. Di daxuyaniyê de aşkera kir ku 20 mîlîtanên wan kembara intiharê li xwe pêçane û ketine nav wezaretxaneyên Qabilê. Hate ragihandin ku li navenda bazirganiya dan û standîne wesayîte bombe lê barkirî hat



Li Efxenîstanê her roj bi dehan kes jiyana xwe ji dest didin û şer û pevçûn bûye perçeyeke ji yana rojane. Ev wêne jî rastîya Efxenîstanê radixe berçavan

teqandin bi kêmanî 5 polis hatin kuştin. Çend sed metre nêzî vê teqînê li ber sinemayê ji teqîneke din pêk hat. Lê nayê zanîn ku di encama

vê teqînê de çi xesara can û mal pêk hatiye. Berdevkê Wezaretê Karên Hundirîn Zemaray Başharî diyar kir ku di vê serdagirtina mîlîtanên Talîbanê de 4 mîlîtan kuştine û şer bi saetan dom

kiriye. Rayedarekî polis ji diyar kir ku li navenda bazirganiya dan û standîne 2 parazvan û 3 sivil hatine kuştin. Çavdêr destnîşan dikin ku di nav salekê de serdagirtina herî mezin e ku li peytext Qabilê pêk hatiye. A.WELAT / HAWAR NET.com

## "Em dikarin li Îranê bixin"

Derbarê êrîşek ser Îranê de daxûyanî û nîqaş zêde dibin

WASHINGTON: Fermandarê hêzên navdendi ya artêşa DYE'yê David Petraeus diyar kir û got: "Em her çîqas dixwazin ku pirsgrêka xebatên nuklerî ya îranê bi r, ya diplomasiyê were çareser kirin ji ger helwesta îranê wisa dewam bike em dikarin tesisên nuklerî ya îranê lêxin." Îran: Sistema me ya fuze yê pir xurt eDi aliyekî din de ji rayedarên îranê diyar kirin ku sistema wan a fuze yê ji texmînan zêdetir bihêz e...

Ji Angela Merkel tehdît

Di hevdîtina xwe ya bi Serokwezîrê Îsrail Benyamên Netanyahu re, Serokwezîra Almanya Angela Merkel gefên kirdaran li Îranê kirin. Di wê hevdîtina Merkel û Netanyahu de hat ragehandin ku gava Îran di warên çekirina çekên atomî de helwesta xwe neguherîne, wê Almanya li himberî Îranê kiryarên berfireh werbigre. HAWAR NET.com

## Dîplomasiya Almanyayê ji nû ve teşe digire

Ji ber têkiliyên aborî û siyasî yên di navbera Almanya û Tirkiyeyê de her dem daxwazên kurdan bûne qurbana van têkiliyan. Kurd jî ji bo ku bi rengekî çalak daxwazên xwe bînin ziman û bi hikûmet û raya giştî ya Almanyayê bidin zanîn ketin nava liv û tevgerê

DORTMUND (Pêşketin): Cara yekemîn e ku 30 rêxistinên sivil ên alman panelên hevbeş li dar dixin û bi parlamenterên BDP'ê re li Parlamentoya eyaletê hevdîtin pêk tinin.

Tevî ku sazî û dezgehên kurdan gelek caran ji ber vê têkiliya di navbera dewleta tirk û alman de ji alî hikûmeta alman ve dihatin serdagirtin ev yek nîşan dide ku êdî hikûmeta alman hinekî din hewl dide ku daxwazên kurdan fêm bike. Ji ber ku hikûmeta alman her dem hewl dida ku kurdan kriminalîze bike, ji ber vê yekê hikûmetê nedihîşt ku pirsgrêka kurd bikeve rojê ya wê wêlî û ji bo pêkanîna vê yekê çewisandin dikir.

Kurd jî ji bo ku nebin qurbanên vê berjewendî û sûdwergirtina di navbera Tirkiye û Almanyayê de hem li Almanyayê û hem li Tirkiyeyê ji bo nasnameya kurdan bi derdoreke berfirehtir bidin zanîn û qebûlkirin di nava liv û tevgerê de ne û têkiliyên xwe bi derdoreke berfirehtir re dikin.

Tê texmînkirin ku di navbera 750 hezar û yek milyoni de kurd li Almanyayê dijîn. Kurd êdî naxwazin bi nasnameya tirkî werin naskirin loma dixwazin îstatîstîkî li gorî nasnameya kurdîtiyê ji werin amadekirin.

Fedrasîyona Komeleyên Kurd a Almanyayê (YEK-KOM), cara pêşî tevî 30 rêxistinên sivil ên alman rêzepanek li dar xist. Di van panelan de gelek siyasîmedarên navdar ji beşdar bûn û agahiyên girîng li ser danasîna pirsgrêka kurd dan.

Ji bo zêdetir nûçeyên NAVNETWEYÎ hawarnet.com

Di KURDO de her tîşt li ber destê te ye...

Ename, sohbet, listik nûçe, video, kêf, agahî û zêdetir...



## 'MATRÎKS' DIBE RASTÎ



I Wezaretê parastîne a DYE yê ji bo tetbîqata şerê siberî simulasyonêk wek filma 'Matrix'ê pêş dixê. Ajansa lêkolîna projeyên pêşdeçuyî (DARPA) ya girêdayê Wezaretê parastîne a DYE yê projekêk ji bo tetbîqatê projekê simulasyonê a pêşketî despê dîke. Di simulasyonê de programên kompîterê ên wek mirovan bike xwe program bike de bi çekên siber ên newş bê ceribandin.

Tê hêvîkirin ku di simulasyona bi nav qada siber a netewî (NCR) de programên kompîterê tevgerên mirovan û lawaziya mirovan yek û yek eşkere bike. Simulasyon, vi awayî bi navê parastina netewîya siberî, êrîş û parêzîyê de bê karanîn.

Hate diyar kirin ku ceribandina 2'yemîn temam bûye, lê belê NCR ji bo qepasîteyek tîjî bê karkirin ne amadeye.. HAWAR NET.com

## Ji Bo Bidestxistina Kar, Şansê Derçûyên Zanîngehan Bêhtir e

Pêşbînîyên pisporan yên derbarê pêşhatên bazara kar li Almanya diyar dikin ku her kesê bixwaze bo cara yekem bikeve bazara kar, wê demekê rastî astengîyan were. Lê ji bo derçûyên nû yên zanîngehan, dibe ku rewş ne weha tari be. Ji ber ev qeyran wê bandoreke mezin li wan neke. Tê pêşbînîkirin ku îsal hejmara bêkaran li Almanya, ji çar milyon derbas bibe û dibe ku

di mehên li pêşîya me de, piraniya kompaniyayên pêrabûnên pêwîst ji bo parastina karkerên xwe bapêjin da ku neçar nebin wan ji kar bavêjin. Hin çavkaniyên Biroya Federal ya Kar li Almanya dîr dibînin ku bi armanca vedîtina karekî din, karker dest ji karê xwe yê niha berdin. Bi gor wan daxuyaniyên ku di malpera DW de hatine weşandin, wê bazara karî daxistî bimîne û rêya vebûna wê ji ne diyar e.



Kurdistan Dergûşa Şarîstaniyê Roniya Pêşarojê

HAWAR NET

# Zanist û Teknolojî

## Spor ji bo rê li gellek nexweşiyên digre

Li gor lêkolîna kovara "Circulation"ê de hati weşandinde biahengî spor bê kirin pîrbûna şaneyan dereng dixê

AMED (Pêşketin)

Lêkolîna zanîyê zaniyê Saarlant a Elmanya, Irich Laufs û ekîba wî derxist holê ku tîkîliya spor kirin û enzîma Telomeres a ku belav bûna gelek nexweşiyên wek pençêşêrê dereng

dixê bi hev re he. Zanyaran cara pêşî ji bo bandora sporê a li ser Tansiyonê, Kolestrolê, Şekirê xwinê, û sererastkirina standina kiloya û kêmkirina hînek cureyên pençêşêrê li ser Mişkan lêkolîn kirin HAWAR NET.com



## Alzheimer wê berî ku derkeve were zanîn




AMED (Pêşketin): Alzheimer wê 20 salan berê ku derkeve were zanîn  
Komeke zanîyên Britani diyar kirin ku ew kişî kirine ku nexweşiya Alzheimer berî ku derkeve dikare were teşxîs kirin.  
Li gor agahiyên ku hatiye danîn dê bi tîseke hêsan a ser çavan wê

nişaneyên derketina nexweşiya Alzheimer bêne tespît kirin.

Hate zanin ku teset dê nava 3 salan were bikaranin.

Alzheimer nexweşiyêke norolojîk e û dibe sedem ku mirov qebiliyê xwe yê tevgerin û fikirî jî dest bide, hiş mirov tîkîçe û pîrani dema pîr bûnê de derdikeve holê.  
HAWAR NET.com

## Dê 4 salan de cîhanek nû peyda bikin



AMED (Pêşketin): Astronom bi bawerî ku herî dereng di nav 4 salan de cîhanek wek cîhana a me wê bê kîvîşkirin.

Xebatên kîvîşkirina gerstêrkên ji sistema rojê derve bi lez dewam dike. Sala 2000'ê de 19 gerdûnên ji sistema tavê derva hatin kîvîş kirin. Ev hêjmar heta sala 2009 bûn 84.

Astronoman îdda kirin ku heta 4-5 salan wê dinyayeke wek dinê a me û di te de jiyan heye an jî mercên jiyanê tê de heye...

NASA û ESA hem fikirî ku gelek gerdûnên wek dinê jiyan tê de heye hene..

Serokê Estûtuya lêkolîna Ames a girêdayê NASA yê Simon Worden di wê baweriyê de ye ku fezayê de gelek gerstêrkên jiyan heye. Li gor Worden nava 4 salan de yek wê bê ditin.

## Cîhan dikare bibe qûrbana teqîna stêrkekê?

LONDON (Pêşketin): Astronom diyar dikin ku ev îxtimaleke pîr bicuk e û bandorên teqînê dibe ku bi sedan şûnde ser cîhanê hebin.

Gelo dê TNT ya ku bi hêza "20 trilyon car trilyon car trilyon megaton" biteqê dinya ji holê rabe?

Astronomên Emerî tespît kirin ku nêzi 3 hezar 260 sala ronî (şewle) yê duriyê de stêrkek bi teqîne ku jê re "Supernova" tê gotin biteqê.

Tîştê eceb jî eve ku dibe ku bandora ev teqîna termonuklerê heta dinya ya me jî bigehêje û ozonê jî holê rake.

Lê astronom diyar dikin ku ev îxtimaleke pîr bicuk e û bandorên teqînê dibe ku bi sedan şûnde ser cîhanê hebin..

## Epîlepsî nexweşiyek çawa ye?

Epîlepsî yek ji nexweşiyên norolojîk e. Ji sedemên tevlihev ên meji tê. Zêdebûna elektrîkê di fonksiyonên meji û xerabûn di tîkîliyên navbera beşên meji bîngê in. Di hînek minakan de sedî sed sedem û çareserî nayê zanîn. Nexweşî xwe bi krîzên nebîrêkûpêk ên ji nişka ve rûdidin dide der. Pîrranî nexweş bo demekê ji hişarê dikeve, jixweve diçe. Di hin minakan de dipelpite û kef jî dev tê.

Li Kurdîstanê di krîzên epîlepsiyê de pîvazê didin ber pozê nexweş daku li hişarê vegere. Ev rêbaz çendin bikêr e nayê zanîn.

**Hin sedemên ku epîlepsiyê ditetikînin**

Kêmasiya vitamîna B6

Zêdebûna kronîk a tîna laş

Menenjit hwd nexweşiyên norolojîk ên piştî jidayikbûnê

Hin cureyên tûmorên norolojîk

Sawên mezin

Îşemî ya meji, angi kêmxwîngirtina meji

Di bicanîbûnê de bikaranîna elementên nelirê ya dê

Bûyerên bixeterê, nelirê yê di jidayikbûnê de, wekî

kêmgirtina oksîgenê hwd

Epîlepsî pîrranî di 6 saliyê de destpêdike. Hin nexweş

dema bêhneke biyan digirin dikevin pêla krîzê. Hin jî

dema televizyonê temaşe dikin, krîz destpêdike. Lê ev

minakan ne standart in. Bi Kurdî jê re dibêjin "BÊHÎŞÎ

yan FÛ"

**Terapî**

Heger krîz li pey hev tî û jî 20 dq zêdetir didomin divê

sedî sed mirov bang li ambûlansê bike. Bijîşk bo terapiya

destpêkê ji koma Antikonvulsîva ya jî malbata

Benzodiazepîne dermanan bikartînin. Nirxên EEG dide,

rêbaza terapiyê kîvîşe dike.

## Gastrît çima derdikeve holê?

Gastrît nexweşiyêke madeyê ye û bi werimgirtina mûkoza madeyê xwe dide der. Hin elementên kimyayî dengê baz û asîdê ya organîzmayê xerabîkin lewra ew li dijî amadekirina siruştê ne. Bo minak alkol, sigara, xwarînen tîr hormonî hwd mûkozaya madeyê dixurîfin, ziyane didin. Disa hin nexweşiyên mîkrobîk û alergîk jî ditetikînin. Xwe bi êşa madeyê, madelihevketîne, bêmadeyî, verêş û bêaramiyê nişandike. Gori sedemê terapi tê amadekirin. Heger sedem bê zanîni terapi hêsan e. Hin caran xwe bi êşa organên din dide der lê ev kêmkirî e. Bo minak êşa singê, êşa dil hwd. Heger nexweşî dijwarî terapi dibe û domdar e, bijîşk dikevin şîkên din. Wekî kêmbûna xwinê, kêmbûna hesin di xwinê de hwd. Dengê baz û asîd û jînûveavakîna wê bîngêha terapiyê ye..

## Hîpertansiyon çiyê?

Hîpertansiyon an LBX (Lêdana bilind a xwinê) yek ji nexweşiyên sereke yê NDD (Nexweşiyên dil - demar) e.. Koda nexweşiyê di bijîşkiyê de ICD-10-Code Hypertonia I10.0 Heger jî vî radeyê berjêr an berjor be, divê mirov tîkeve şîka NDDê. Ji bo LBXê "Mêrkujê malê" yan "Dijmîne jî malê" tê gotin. Lewra mirov zû nasnake û lê nakeve şîkê. Hîpertansiyon yek ji tabloyên herî mezin û ruhstîni ê serdema me ye. Her sal bi milyonan mirov jî ber nexweşiyên ku hîpertansiyon sedem im, dimîrin.

Dileke normal û bêproblem di rehetiyê de li dora 60-100 carî lêdide. Divê mirov him jî aliyê hêza lêdanê, him jî jî aliyê hejmarê lêdanê carekê dilê xwe bide kontrolkirin..

Ji bo hîpertansiyonê spor kirin û baş hîlbijartîna xwarînan bi taybetî xwarîna sebzeyan û xwarînen kêmkirî xwê û kêmkirî girîng e.. HAWAR NET.com

weşanên nûçe - rojname - tv - kovar - radyo

**Hemû linkên ji medyaya Kurdî.**

**Cihê we yê destpêkê!**

Bixwînin - Zindî Temaşe û Gûhdarî bikin  
**medyayakurdi.com**





# Çand û Hûner

## Li gor Nilufer Akbal "Herîrî" di muzîka Kurdî albûma herî cûda ye

AMED (Pêşketin)

Hûnermenda navdar a muzîka Kurdî a hemdem Nilufer Akbal ku ji ber tevli bûna wê ya di TRT6 de demeke dirêje tê rexne kirin bi albûmeke nû derdikeve pêşberî hezkîrîyên xwe. Navê albûma nû ya akbal "Herîrî" ye. Albûm bi stîla pop-folk û pop-rock hatiye amade kirin. Di albûmê li gerl stranên nû stranên geleri ji bi şeweyeke nûjen ji nû ve hatine çêkirin. Di albûmê de bi her 3 zaravayên zimanê Kurdî stran hene.

Akbal ji albûma xwe bi hêvî ye û îdda dike û di muzîka Kurdî de cara pêşîye albûmeke wisa cûda derdikeve.

Ji bo 4 stranên di albûmê klîb hatine kişandin. Albûm vê hefteyê dikeve bazare. Klîba pêşî ku were wşenadin ji "Kîme Ez" e. Hûn dikarin di malpera Nilufer Akbal de ji albûma dawî çend stran guhdari bikin... Malpera Nilufer Akbal ji eve; <http://www.niluferakbal.com/kr/> MUZIKKURD.com



## Belgefîlmê dengbêj Evdalê Zeynikê hat kişandin

Di diroka dengbêjiya kurdan de Evdalê Zeynikê pirê dengbêjên kurd e. Niha li ser Evdalê Zeynikê belgefîlmekî hat kişandin.

Rojnameger û nivîskar Bulent Gunduz li ser dengbêjê navdar, pirê dengbêjan Evdalê Zeynikê belgefîlmekî kişand. Belgefîlm yekem car di 26'ê wê mehê de wê li Parisê derkeve pêşberî temaşevanan.

Ji bo kişandina belgefîlm Gunduz tevlî komeke ji 15 kesan pêk hati çû gundê Kosa ku girêdayî navçeya Qereyaziya Erzeromê ye. Komê hem li wê derê hem ji li gundê Qanciya ku gora Evdalê Zeynikê li wê derê ye dimen ji bo belgefîlm kişandin.

Mirê bilurê Egîdê Cîmo ji Êrivanê hat gundê Kosa û li gundê Qanciya li ser gora Evdalê Zeynikê kilamên Evdal bi enstrumantên xwe yên herî baş ve lê xist. Dengbêj Zahiroyê Mûşê, Xeniyê Qereyaziyê, dengbêj Apê Bekir, Marûf, Gazin, Şemdin û Nivîskar Haydar Gunduz bi kilam û lezyên xwe yên bêhempa reng dan belgefîlmê Evdalê Zeynikê. Ji bo zindikirina rola Evdalê Zeynikê dengbêj Xeniyê Qereyaziyê list.

Ji bo belgefîlm bi dehan kesî re hevpeyvin li gund û bajarokên Serhedê hatine kirin, li Ewropayê bi alikariya nivîskar Gunay Aslan, hûnermend Delil Dilanar û hin kesên din li ser felsefeya dengbêjiyê ya Evdalê Zeynikê hate sekinin û ev yek li belgefîlm hatin kirin.

Bî giştî li Wan, Bazîda Agiriyê, Çiyayê Araratê versiyona Îdir û Bazîdê, li Îdir, Agirî, Toprakkale, Tûtax, Xamûr û li Xînûs, Tekman, (Tatos) Qereyazî, Belçîka û Parisê her wekî din li Serhedê gelek gundên ku Evdal lê geriya ye belgefîlm hat kişandin. Her wiha derhêner di belgefîlm de jinên dengbêj ji derxistîye pêş. Belgefîlm di bin derhêneriya Gunduz de ji aliyê Post-produksiyon ve hatiye kişandin û muzîka wî hûnermend Delil Dilanar çêkiriye.

Derhêner Bulent Gunduz ji bo belgefîlm wisa dibêje: "Hûnê xwe di nav temaşeyên ku sed sal berê Evdal lê jiyaye de his bikin." Belgefîlmê zimanê wî bi kurdi pêşî wê li Parisê galaya xwe li dar bixe û dûre li Tirkiyeyê li hin cihan bê nişandayin. Li Tirkiyeyê dê bi jêrnivîsa tirkî bê nişandayin. **DIYARNAME**

## Zimanê Çiya li Wêranşarê bû



Listikvanên Şanoya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê (DBŞT) bi listika xwe Zimanê Çiya li Wêranşarê derket ser dikê. Listik li Salona Şanoya Navenda Çand û Hunerê ya Şaredariya Wêranşarê hate nişandan. Cigirê Şaredarê Wêranşarê Mehmet Burun,,

Serokê BDP' a Navçeyê Mehmet Ali Turk û bi sedan kesî listik temaşê kir. Derhênerê kanadayî Luicano Longa temaşevan ji tevli listikê kir. Listik bi navê Zimanê Çiya bi eleqeyeke mezin hate temaşekirin

## Pirtûkên çîrokan ên kurdî belavkirin

AMED (Pêşketin): Şaredariya Baglarê ya Amedê, li Salona Girtî ya Sporê, di çarçoveya şahiya çandê de şahiyek pêk hat û li 500 zarokî pirtûk belav kir. Di merasimê de ligel Şaredara Baglarê Yuksel Baran, Serokê Rêxistina BDP'ê ya Amedê Mehmet Ali Aydın û nûnerên saziyên civakî 500 xwendekar amde bûn. Baran, li 500 xwendekaran pirtûkên çîrokan kurdî belav kir û diyar kir ku pirtûkên mane ji dê li taxan li xwendekaran belav bikin.

Baran, diyar kir ku ji bo zarok bi zimanê xwe, çanda xwe, wêjeya xwe û kevneşopiyên xwe nas bikin çîrokan bi kurdî belav dikin. Baran anî ziman ku dê ve xebata xwe bidominin. Baran, destnîşan kir ku wan di çarçoveya hişyariya „Zimanê me rûmeta me ye“ ev kampanya dest pê kiriye. Rêveberê TZPKurdî ya Amedê Ferat Dengiz û nivîskarê pirtûka çîrokan Hogir Berbir ji axaftin kirin xwestin ku her kes bi zimanê xwe bixwine û bi axivin. Şahî, bi listikên ekiba folklorê ya Navenda Perwerdehiya Zarokan a Şaredariya Baglarê bi dawî bû.

## Madonna bi albûmeke nû tê...



AMED (Pêşketin): Madonna di albûma xwe ya dawî de tişên ku hêvî dikir bidest nexistibû. Albûma ku 2007'an de derxistî bû serkeftin bi dest nexistî bû. Madonna dixwaze niha heyfa albûmê xwe dawin dixwaze derxîne.

Madonna albûma xwe ya 12'emîn de bi navên supriz bixebite. Madonna; vê carê bi prodûktorê navên wek Pearl Jam, AC/DC ve Rage Against The Machine Brendan O'brien li hev kir. Madonna ku ku her tim tarzên nû diceribîne vê carê ji li pêy terzeke nû ye. . MUZIKKURD.com

## "Du ziman û baholek" di nav 10'an de ye

Endamên SIYADê 10 filmên serketî yên ku sê mehên paşî de ketine vîzyonê hîlbijartin. "Du ziman û baholek" di nav listeyê de di rêza 8'a de cih girt.

Li Tirkiyeyê her hefte li dor pênc filman film dikevin vîzyonê. Komeleya Nivîskarên Sinemayê (SIYAD) her sê mehan carekê ji nav van filmaên ku di sê mehan de ketine vîzyonê û ji aliyê nivîskarên wan ve bi awayekî hatine nirxandin, listeya wan çêdike. Ji nav vê listeyê 10 filmên ku herî zêde stêrk steyê de cih girtiye.

Şirketeke turizmê li Hollanda di afîşên xwe yê reklaman de sûretê Atatirk tevî jinên bi bikini belav kir. Belavkirina wan wêneyan bû sedema nerazibûna Tirkan li Hollanda.

## Serdema zarokên dijîtal

Di rapora ku ji aliyê Dîsneyê ve hatibû amadekirin de derket holê ku zarokên ku temenê wan di navbera 8-14'an de diguhere cîhaneke bê teknoloji xeyal nakin

Ji bo kanala zarokan a Disney XD yê xebatên lêkolîn hatin meşandin û her wiha Dîsneyê der barê vê de raporek amade kir. Li 6 welatên Ewropayê lêkolîn hate meşandin. 3 hezar û 20 zarok tevî lêkolînê bûn. temenê wan di navbera 8-14'an de diguherî. Di encama lêkolînê de derket holê ku ligel têkiliya zarokan a bi internetê re, helwestên xwe yê ji bo malbat û pişeya ku difikirin ji derdixin holê. Ji bo zarokên ku cîhaneke bê internet nafikirin,

'Nifşa XD', yanî zarokên dijîtal yê nifa X'ê tê gotin. Di encama lêkolînê de ev tişt derketin holê; "Ji van zarokan ji sedî 30'i bi hevalên xwe re nayên cem hev. Kişandina peyaman ji sedî 15, sohbet ji sedî 14 û axaftina bi telefonê re ji sedî 8 e." Ji sedî 95'ê zarokan bawerîya wan eve ku internet ji bo wan tiştê herî girînge. Ji sedî 53'ê dibêjin ku internet ji bilî hevandinê rû bi rû, têkiliya bi hevalan re zêdetir dike. Her wiha ji sedî 74 ji inernetê ji bo listikê tê bikaranîn.



## Ji % 35'ê temaşevanên pornojê jin in

Li gel hemû hewlan belav bûna pornojê nayê sekinandin...

Naveroka herî xeter a ser psikoloji û jiyana sosyal a mirovan a ser internetê naveroka porno ye. Ekonomiyê mezîna a sektora pornojê heye. Porno herî zêde li DYE tê çêkirin. Herî zêde ji li asyayê tê temaşe kirin. İstatîkên dawî a derbarê pornojê de wisa ye; -Ji %43ê bikarhênerên internetê naverka porno vedikin. -Ji % 35'ê temaşevanên pornojê jin in -Maweya temaşekirina pornojê nêzî 20 deqîqe ye.

-Çini Koreya Başûr û Japoniya welatên ku herî zêde ji bo pornojê pere didin e. -DYE di rêza 4'emîn de ye û her sal 13,6 milyar dîlor ji bo pornojê xerc dike. -Televîzyon, malper, kovar, şirketên çêker û otel her sal ji vektorê bi milyonana dolar bidest dixin. -Her sal amator an ji profesyonel nêzî 20 ehzar filmên porno tê kişandin. -Ji %10ê temaşevanên pornojê tiryak in. -Stêrkeên jin ên pornojê her sal nêzî 150 hezar dolar qezenc dikin. Mêr ji nêzî 40 hezar dolar qezen dikin.



## Kûpa Afrîka dest pê kir; di maçekê de 8 gol

Di 1. maça Kûpaya Afrîkayê de Angola û Mali weka hev man: 4-4 Kûpa Afrîkayê bêyî Togoyê dest pê kir. Pistî ku otobûsa Togoyê bû armanca êrîsekê û sê leyistikvan hatin kustin, Togo ji Kûpa Afrîkayê

vekişîya. "Di yekemîn masa Kûpa Afrîka de mazûban Angola û Mali hatin hemberî hev. Angola 4-0 kete pês lê di 10 deqîqeyên dawî de li ser hev gol xwarin û maç 4-4 bidawî bû.

## Agirê Jiyan hemberî Tatlisêsê ji ber dizekîyê doz vekir

Koma muzîkê ya navdar a kurd Agirê Jiyan, amadekarî dike ku li hember İbrahim Tatlisêsê dawê bide vekirin. Agirê Jiyan, ji ber ku strana wan berhevkerî a bi navê Şemamê i aliyê İbrahim Tatlisês ve bêdestûr hatiye bikaranîn û gotinên stranê hatine guherandin, wê serî li rêyên zagonî bide. Solistê Koma Agirê Jiyan Ali Geçimli, dide zanin ku, ew li ser vê yekê bi MESAM û dezgehên têkildar yê din re ketine nava danûstandinê û biryar dane ku, serî li rêyên hiqûqî bidin. Geçimli, herweha diyar dike ku, ew ne li dij wê yekê ne ku, ev stran ji aliyê hin kesên din ve bê xwendin; lê ew herweha nerazî ne ku ev strana gelêrî a ji aliyê wan ve hatiye berhevkerin, bi awayek dejenerekirî û bi mebesta asimilasyonê bê bikaranîn. Ali Geçimli li hember vê yekê weha reaksiyon daye nişandin: "Ev yek qetlîam e. Taybetiya dirokî ya vê berhema otantik heye. Heger hûn vê yekê xira bikin, gotinên wê biguherînin û bisitirin; ev yek ne helwestek exlaqî ye û ne qanûnî ye ji. Emê li hember vê yekê xemsar nebin û çî pêwîst be emê bikin. Geçimli, di berdewamiya axaftina xwe de dibêje, heta niha kes bi wan re neketiye têkiliyê, ji bo bikaranîna vê stranê destûr nexwestiye, ewê nehêlin çanda kurd bê talankirin.

## Kûrê Qaddafiyê 1.2 milyon dolarê Beyonce'ê kir kuçika xwe

Carek din îspat bû ku pere mirovên navdar ji dixê çî halê.. Kûrê serokê Libya Qaddafiyê, Mutasîm-Bilah bi 1.2 milyon dolarê stranbêja navdar a Emeriki

Beyonce'ê kir kuçika xwe. Di wêneyan de tê dîtin ku Beyonce di sehneyêke biçûk de bi kincên xwe yê reqsê dilê Mutasîm-Bilahê xweş dike.



Yekem û yekane weşana nûçeyî a Kurdî ya muzîka Kurdî nûçe, albûmên nû, liste, agahî, klîp, jiyanname, gotar

Klîpên nû, filmên karton bo zarokan, dokumanter, filmên ji sinemaya kurdî û cihanê, awazên dengbêjan, dîmen, pêkenin, konserên hunermendên hezkirî

Niha Zindî binêre

HAWARTV

# JI BO REKLAM ÎLANÊN WE

Hûn dikarin di Pêşketin, HAWAR.NET.com an jî weşanên din ên koma HAWAR de reklam û îlanên xwe bi nirxa herî gûncaw biweşînin.

têkîlî agahi@hawarnet.com